# Xalên Girîng ên Pêvajoya Penaberîyê

Her hemwelatîyên welatên sêyemîn an jî kesên bêregezname/bêwelat mafê wan heye ku serlêdana daxwazîya penaberî bikin. Gihîştina li pêvajoya penaberî serbest û bêpere ye.

## 1. Daxwazîya Penaberî an jî Serlêdana Parastina Navnetevî

***Daxwazkarên Penaberî an jî Parastina Navnetewî***

Daxwazkarên penaberî an jî parastina navnetewî ewe ku hemî hemwelatîyên welatên sêyemîn, ku daxwazîya serledana parastina navnetevî yekem an jî dûyem car, li hemberî rayêdarên berpirsiyaran dikin. Rayedarên Yûnan du şêwaz/cûreyên parastina navnetevî didin: Statûya penaberî û statûya parastina alîkarî.

Statûya penaberî tê dayîn ji bo kesên ku bi pêwistî terk kirîye welatê xwe yê zêdî an jî, li rewşa bêzêd/bêkok, li welatê navnîşana xwe yê berê, û nikari an jî naxwazi vegere wî welatî ji bo sedemên peyketin/teqîbatên li ser zêdî, olî, netewî, bawerîya wî yê sîyasî an jî beşdarbûna wî/wê li koma cîvakîya taybetî.

Statûya parastina alîkarî tê dayîn ji bo  kesên ku nikare bênaskirin wek penaber ji ber ku şertên jor bi cî nake, lê li ser wî/wê sedemên pêwist li ser jîyana wî/wê heye ku zerarê girîng çê bibe li welatê wî an jî li welatê navnîşana wî yê berê, ji ber ku xeteriya cezayê mirin an jî kuştinê, îşkencekirin an jî tadeyî an jî bikaranîna nêmirovatî an jî xeterîya jîyanê an jî temamitî/tevdebûyî ya laşê wî/wê ji bo şerên çekdarîya navxuyî an jî navnetewî li ser wî/wê pêk dibe.

***Serlêdan li ku tê ragihandin/radestdikin***

Rayedarên berpirsîyê serlêdana daxwazîya we ji bo kesên ku nûhatine, noqteyên li giravên Lezvos, Hios, Samos, Kos, Leros û Evros Navendên Pêşwazî û Nasnamekirin ne. Heger hûn serlêdana xwe di navcîhên jor çênekirîye, altarnatîvekê din hûn dikarin serlêdana xwe li Navenda Pêşwazî û Nasnamekirina li Malakasa û Diavata pêk bînin. Ji bo zarokên bêrefeqatî rayedarên berpirsî, ji bo serlêdanên ku bişînin, Nivisgeha  Penaberîyê Heremî û Qademeya Penaberîyê a Xweser e.

Serlêdan rûbirû/şexsî pêk dibe. Heger hûn tomar nebûne, dikarin randevû bi platforma elektronîkê Wezareta Koçberî û Penaberî ji bo tomarkirina Navenda Pêşwazî û Nasnamekirina li Malakasa û Diavata werbigrin.

Heger hun  bê belgeyên fermî hatine welat  an jî li Yûnan bê belgeyên fermî dimînin,  wê gavê  wê we veguhezin li Navenda Pêşwazî û Nasnamekirî û heger belgeyên we ê  fermî ji bo nîşankirina hemwelatiyê û nasnameya we tûne bin,  wê gavê hûnê wê demê di pêvajoya pêşwazî û nasnamekirinê derbas bibin.

Divê heta ku pêvajoya lêkolîna serlêdana we didome pêwite hûn li navendê bimînin û  ew wext ji bîst û pênc (25) rojan derbas nebe.

Bi tevahî, lêkolîna serlêdana we dibe ku ji bîst (20) rojan heya şeş (6) mehan bigire.

***Tomarkirina serlêdanê***

Tomarkirina bitemamî a serlêdana we  agahdariya nasnameya we,welatê zêde yê, navê bav,

dayik, hevjîn û zarokên we, navnîşana e-mail a we heke hebe, agahîyên nasnameya biyometrîk, daxûyaniyek tevahî ya sedemên ku hûn parastina navneteweyî dixwazin, navnîşana niştecîh an jî rûniştinê,zimanê ku hûn dixwazin serlêdana we pê were lêkolîn kirin û heke hûn bixwazin diyarkirina nûnerê bi wekaletname.

Dibe ku hûn di lêgerîna laşê we an jî lêgerîna tiştên we derbas bibin. Dibe ku hûn di kontrola a bijîşkî re derbas bibin.
Dema ku hûn serlêdanê dikin, dê wergerek/tercumanek hebe ku ji we re bibe alîkar daku hûn bi rayêdarên têkildar re bi zimanekî ku hûn jê fam dikin ji bo agahdarîya pêvajoyê, maf û erkên we wekî daxwazkarê/a parastina navneteweyî, û her weha ji bo demên ku di dema pêvajoyên de doza we derbas dibe.
Di roja serlêdana we de, wêneyê/sûretê we bê kişandin û şopên tiliyên we û endamên malbata we yên ku ji çardeh (14) salî mezintir in, bêne girtin. Şopên tiliyan dê bikevin Bingeha Navendî ya Ewropî ya EURODAC, û ger serlêdana we ji bo parastina navneteweyî li dewletek din a Ewropî ya ku Rêziknameya Dublin III bibe, dibe ku hûn li wir werin veguheztin ji ber ku serlêdana we li wê dera lêkolîn kirin.

Rêziknameya«Dublin III»destnîşan dike ku kîjan dewletên Ewropî berpirsîyar û girêdayî ye ji bo lêkolîna serlêdana we.
Kriterên/pîvanên ku têne bikaranîn di rêza hiyerarşîk de jêrîn in:a) têkiliyên malbatî,b)xwediyê vîzeya dawî an jî destûra rûniştinê ya li Welatekî-Endama Ewropa û c) ketina yasayî an jî neyasayî ya Yekîtiya Ewropayê.
Divê ku hûn belgeyên rêwîtiya xwe bidin (mînak pasaport), an jî belgeyek din ku di destê we de hene û jibo lêkolîna serîlêdana we re têkildar e û bi ererastkirina nasnameya xwe û endamên malbata we.
Agahdariya ku hûn bi girêdana serlêdana xwe de pêşkêş dikin nehênî/veşartî ne. Karmend xwedî erka nehenîtiyê ne û agahdariya ku hûn di dema lêkolîna serlêdana xwe de didin wan, dê ji Rayedarên welatê we re neyê eşkere kirin.

Hûn dikarin bi Komîseriya Bilind a Neteweyên Yekbûyî ji bo Penaberan re têkilî daynin an jî bi Rêxistinek ku alîkariya yasayî, piştevaniya bijîjkî û derûnî pêk tînin bikin.

Heger tu mexdûrê îşkence/tazîp, tecawiz û tundûtûjîyên giran bî, divê ku tu rayedaran agahdar bikî ku ew jî alîkariya te bikin.

Di dema pêvajoyê de mafê we heye ku hûn alîkariyê ji parêzerek an jî şêwirmendek din, bi bijartina xwe, bixwazin (bê navbeynkariya Nivîsgeha Penaberiyê).Di vê rewşê de pêwiste ku hûn bi nivîskî destûr bidin parêzer an şêwirmendê xwe ku li wê derê îmzeya weya orîjînal hewce ye, ji ber ku di dema hevpeyvîna we de amade bin an jî li ber Nivisgeha Penaberiyê nûnertiya we bikin. Xerç û lêçûnên/mesrefên parêzer an jî şêwirmendê li ser we ye. Hûn û hem jî parêzer an jî şêwirmendên we yên rayedar bi daxwazîya we dikarin bigihîjin belgeyên ku di dosyaya weya îdarî de hene.

Nivîsgeha Penaberiyê wê ji we re rojek hevpeyivînê diyar bike û hûn ê Bergenameya-qerta Daxwazkarê/a Parastina Navdewletî bistînin ku dikare heya salek (1) bimîne. Divê ev Bergename/qartê we, her dem bi we re hebe. Dema ku Bergename derdixin, ku di şiklê qertê ye. em ê hejmarek bacê (A.F.M.) û hejmareyek ewlehiya civakî û lênihêrîna tenduristî ya demkî (P.A.A.Y.P.A.) bidin we.

Ger hûn di nav komek lawazde bin û hevpeyvîna we ya plansazkirî/amadekirî di nav panzdeh rojan de piştî serlêdana serlêdana we bibe, wî gavê Nivîsgeha Penaberiyê demekî têr(heta 3 rojan) dide ku hûn hevpeyvîna xwe rast amadebin û bi parêzerek an jî şêwirmendek bi we bişêwirin ku ew di dema pêvajoyê de alîkariya we bike. Hûn di nav komekê lawaz tên hesap kirin heger bi taybetî hûn biçûk bin, xizmên yekserên mexdûrên keştîya binavbûyî (dêûbav, xwişk û bira, zarok, hevjîn) bin, kesekê astengdar/seqet bin, pîr bin, dûcan bin, malbatekî bi yek dê an jî yek bav bi zarokên biçûk bin, qûrbanîya bazirganîya mirovan bin, kesê bi nexweşîyên giran bin, kesên bi kêmasîya hizrî û derûnî bin, kesên ku qûrbanên êşkence, destavêtin an jî tundî/şidet a din mîna derûnî, laşî an jî zayendî/cinsî hatîye, wek qûrbanên sinetkirina organên zayendî.

Hûn dikarin daxwaz bikin ku hevpeyvîn û werger ji hêla xebatkarek ji zayenda ku hûn dixwazin ve were kirin. Daxwaza we ya têkildar dê ji hêla Nivîsgeha Penaberî ve were hesibandin û heger derfet hebe dê pêk bibe.

***Serlêdana Penaberîya Paşê ya Parastina Navnetevî***

Serlêdana paşê, serlêdana ji bo parastina navneteweyî ye ku piştî biryara redkirina dawî ya ji hêla Polîs an jî Nivîsgeha Penaberiyê an jî Saziya îstinafê ve an jî piştî ku we serlêdana berê ya ji bo parastina navneteweyî we bi xwe îstîfa kirîbû/destjêberda bû, ji nû ve tê ragihandin.

Rayedarên berpirsiyar ku serlêdana we a paşê bikin û **danayên nû** ku dixwazin bidin ev in: Nivîsgeha Penaberîyê Heremî an jî Asta Penaberîyê a Xweser ku li nêzîka cihê rûniştina we ye. Ji bo serlêdana paşê, hûn dikarin platforma elektronîk a Wezareta Koçberî û Penaberîyê randevûyek bistînin.
Piştî radestkirina serlêdana paşê, ji we bergenameya-qerta daxwazkarên/daxwazkaran parastina navnetewî **nayê** derxistin.
Nivîsgeha Penaberiyê dê danayên/ agahiyên nu ku hûn radest dikin lêkolîn bike û biryarê bide ka ew danayên nu bingehîya wan bi serlêdana parastina navneteweyî re têkildar in an jî na.
Tenê heger serlêdana we ya paşî were pejirandin, wê gavê ji we re bergenameya-qerta daxwazkarên/an parastina navneteweyî were dayîn û serlêdana we ji hêla Nivîsgeha Penaberiyê ve were lêkolîn kirin.
Ger Nivîsgeha Penaberî serlêdana we red bike, hûn dikarin di nav penc (5) rojên ji roja ku ji were biryar dayîn de îtîraza xwe li himber Saziya Îstînafê/Temyîzê bikin.
Ger hûn serlêdana duyemîn a paşî bikin, di qonaxa/dema lêkolîna serlêdanê de, hûn bixebixe ji dersînorkirin/vegerandin nayên parastin.
Ji bo serlêdana duyemîn an jî paşê, divê hûn bi serlêdana xwe sê sed (300 €) ewro xercê bidin, ku ew jî bi rêya pêvajoya xercê wergirtina elektronîk (e-Παράβολο) tê dayîn. Di mijara malbatekê de, pêwiste ku ji bo her endamek cuda xercê wekhev were razandin.

## 2. Hevpeyvîna Parastina Navneteweyî

Hevpeyvîn di roj û saetake ku ji aliyê Nivisgeha Penaberiyê ve ji bo we hatiye diyarkirin tê kirin ji aliyê karmendekî berpirsîyar a Nivisgeha Penaberiyê, ku bi xwe xwediyê jêhatîbûna guncav e wê pêk bê.

Pêwite ku hûn pirsên wî bi tevahî rast bersiv bidin, tenê rastiyên rast bi tevahî ragihînin û

agahdariya ku bi serlêdana xwe ve girêdayîne veneşêrin. Ger hûn agahî an jî îdiayên nerast bibêjin an jî radestbikin hûn ê bandorek neyînî li ser nirxandina serlêdana xwe bikin. Karmendê Nivisgeha Penaberiyê di dema hevpeyvînê de bi taybetî li ser agahdariya ku hûn di serlêdana xwe de behs dikin, li ser agahdariya nasnameya we, li ser çawa hatine Yûnanîstanê, li ser sedemên ku hûn ji welatê xwe derketine an jî welatê ku hûn lê rûniştine, ger hûn bêdewlet an na û her weha sedemên ku hûn nekarin an nexwazin vegerin wê, ji we bipirse. Di dema hevpeyvînê de hûn dikarin agahdariya din ku hûn pêwist dibînin lê zêdetir bikin.
Ji bo her endamekî/neferekî mezin a malbatê hevpeyvînek cuda tê kirin. Ji bo biçûkan, hevpeyvînek kesane/taybetî tê kirin ku gihîştina wan û encamên psîkolojîk/derûnî û ezmûnên/serpêhatînên trawmatîk têne hesibandin. Di hevpeyvînê de wergêrek jî dê amade be.Werger bi zimanekî ku hûn jêfamdikin be. Pêşkêşkirina wergerî bêdirave/bêpere ye.

Hûn dikarin bi parêzerek an jî şêwirmendekî din (bijîjk, derûnnasî an jî xebatkarê civakî), re beşdarî hevpeyvînê xwe bibin, pêwiste hûn bi nivîskî destûr bidin wî ku di dema hevpeyvîna we de amade bin an jî li hemberî Nivîsgeha Penaberîyê temsîl bike. Mûçe û lêçûn/mesrefên parêzgerê we an jî şêwirmend li ser we ne.

Tiştê ku hûn di hevpeyvînê de dibêjin veşartî ye. Gotinên we di bin tu şert û mercan de neyê parve kirin bi rayedarên welatê we re. Lêbelê, ew dikarin bi rayedarên din ên Yûnanî re bêne parve kirin.

Dengê we di hevpeyvînê de tê tomarkirin. Karmend nivîsek (destnivîsek) amade dike ku tê de hemû pirs û bersivên hevpeyvînê hene. Ger hevpeyvîn neyê tomar kirin, divê hûn nivîsê hevpeyvînê bi alîkariya wergêr kontrol bikin, naveroka wê piştrast bikin an jî ji bo sererastkirinê bixwazin û îmze bikin. Heger hûn bixwazin, dikarin kopiyek ji nivîsî an jî tomara dengî ya hevpeyvîna xwe bistînin.Hevpeyvîn dikare bi vîdyo-konfêransê jî pêk were.

### 3. Biryara li ser Serlêdana Parastina Navnetewî

Piştî hevpeyvînê Nivîsgeha Penaberiyê biryarê bide ka dê statûya penaberiyê an jî parastina alîkarîyê bide we an jî serlêdana we red bike.

Karmend biryara ji bo serlêdana we, li gorî hevpeyvîna kesane ku bi were hatiye kirin, daxuyani û zanyariyên ku we di dema hevpeyvînê da dane û dîsa agahî û zanyariyên têkildarî welatê we û hemî danayên ku di dosyeyê we a îdarî de hene dide.

Hûn dikarin, dema ku serlêdana we di asta nirxandinêda ye,dest jê bikişînin / îstîfa bikin.

Dibe ku serlêdana we ya ji bo parastina navneteweyî were red kirin, dê wê gavê biryara vegerandinê were dayîn.

Belgeya biryarê ya ku dê ji we re were şandin di gel wî belgeyek di jî heye ku bi zimanekî ku hûn jêfamdikin hatîye nivîsandin, naverok û encamên biryarê bi awayek hêsan û gihîştî vedibêjin.

Hûn dikarin biryara xwe bi kesane rûbirû, bi nameyek taybetî ji we re bê şandin (an jî parêzerê we) an jî bi e-mail ê bistînin.

Ger serlêdana we were red kirin an jî ji we re statûya parastina alîkarî were dayîn û heke hûn bawer dikin ku mafê we yê statûya penaberiyê heye, wê demê mafê we heye ku hûn îtîrazê li Saziya Îstînafê/Temyîzê (Asta duyemîn) bikin.

Divê ku hûn îtîraza xwe pêşkeşî li Nivîsgeha Penaberiyê ya Herêmî an jî Asta Penaberiyê ya Xweser a ku biryara redkirinê daye, di dema ku di navbiryarê we de nivîsandîye, bikin.

Ger ji we re statuya penaberîyê an jî statûya parastina alîkarî were dayîn, hûn dikarin destûra rûniştinê û belgeya rêwîtiyê (pasaport)ya Komara Yûnanîstanê bigrin.

## 4. Çi pêwiste ku hûn bizanibin ji bo Bergenameya/qerta Daxwazkarên/an Parastina Navnetewî

Piştî tomarkirina we a bi temamî (we pêşkêşkiriye) hûn ê Bergenameya-qerta Daxwazkarên/an Parastina Navnetewî (DADP) bistînin, ku ew bi xwe dikare ji sî (30) rojan heya yek (1) salekê bidome li gorî pêvajoya ku daxwaza we bê nirxandin. Bergenameya-qerta Daxwazkarên/an ParastinaNavnetewî (DADP) dihêle hûn li Yûnanîstanê bimînin heya ku lêkolîna serlêdana we bidawî dibe. Ger hûn ji bo serserlêdana xwe biryarek neyînî werbigrin, bergenameya we êdî derbasdar nabe.

Bergename bi şiklê qertê de ye û bi tomara elektronîkî û tê nuhkirin.

Divê hûn bergenameya-qerta xwe di rewşekê baş de biparêzin û her dem bi we re be, ji ber ku ev îspat dike ku we daxwazîya serlêdanê parastina navnetewî pêşkêş kiriye.

Bergenameya-qerta Daxwazkarên/an Parastina Navnetewî ji bo demkî ye û maf û erkên/mecbûrîyetên taybetî peyda dike û **ne wekhevî** ye bi destûra rûniştinê re.

Ji bo kesên ku hatine binçavkirin an jî di pêvajoya Pêşwazî û Nasnameyê de ne, an jî ji bo kesên ku serlêdana paşî dikin, bergename-qert nayê dayîn heya ku serlêdana wan a paşî were pejirandin.

Ji bilî agahîyên kesanê, li ser bergename-qerta dîroka-tarîxa derxistinê, dema derbasbûna wê û Hejmara Sîgorteya Demkî û Tenduristiya Biyanîyan (P.A.A.Y.P.A) nîşan dide.

Pêwiste ku hûn her daîm bergenameya-qerta orîjînal bi we re hebe û taybetî ji bo danûstandina bi Nivîsgeha Penaberîyê re, û bi taybetî di roja hevpeyvînê de. Fotokopî nayên qebûlkirin.

Ger heya dawîya bergenameya-qert ji we re biryarek nehatîye dayîn ji bo serlêdana we, divê hûn bergenameya-qerta xwe nû bikin.

Ji bo nûkirina bergename-qertê, pêwiste ku hûn bergenameya kevn pêşkêş bikin.

Wext/dema we heye ku hûn bergenameya-qerta xwe nû bikin heya roja piştî bidawîbûna wê. **Heke hûn heta rojekî piştî ku bergenameya we bidawî dibe hun nuh nekin, wê dema derbasbûna bergename bidawî bibe û serlêdana we bê betalkirin.**

Ger Nivisgeha Penaberîyê ji ber sedemên teknîkî an jî sedemên dinên têkildarî bi xebata Nivîsgehê nekiribin bergenameya-qerta we nû bike, dê wê çaxê Nivîsgeha Penaberîyê daxûyanîyekê ji bo agahdarkirina raya giştî li ser malpera xwe biweşîne. Di wê rewşê de bergenameya-qerta we bixwebixwe/otomatîk were nûve kirin.

**Ragihanina windakirina bergename-qertê:**

Ger bergenameya-qerta we winda bibe an jî were dizîn, hûn dikarin ji Nivîsgeha Penaberîyê bergenameyekî-qertekî nû bixwazin.

Nivîsgeha Penaberiyê dê belgeya pejirandinê bide we ku ew jî nîşan dike ku we serlêdanek ji bo

parastina navneteweyî pêşkêş kiriye, û li ser wî de hejmara bergename-qert tê de heye.

Bi vê belgeyê hûn ê bi Polîsê Yûnanî re têkîlî daynin, û hûnê daxuyanîyek windakirina bergenameya-qerta xwe rabigihînin.

Dema ku we kopîyekê pejirandî bi morkirî ya daxuyanîya windabûnê wergirt, dibe hûn wê pêşkêşî Nivîsgeha Penaberîyê bikin û ji bo serlêdana bergenameya-qerta nû bikin. Bergenameya-qerta nû nayê derxistin heger du meh derbas nebin ji roja serlêdanê.

## 5. Maf û erkên we wek Daxwazkarê/a Parastina Navnetewî

**α)Mafên Daxwazkarê/a Parastina Navnetewî**
Wek serlêderên/an parastina navnetewî li Yûnan hûn xwedî mafên li jêr in:

- Bergenameya-qerta serlêderiya ya parastina navneteweyî ya bêdirav/bêpere bistînin ku ji we derfeta tevgerê yasayî dide di nava welat de.
- Heta ku nirxandina serlêdanê we bidawî dibe li Yûnanîstanê bimînin û dersînorkirina we qedexeye heta ku serlêdana we bidawî nebe.
- Li welat bi serbestî hûn dikarin tevbigerin, tenê heger di bergenameya-qerta serlêdana parastina navnetewî de tenê beşeke welat serbest hatiye ragihandin, yanê dema biryara sînordarkirina a erdnîgarîyê ku di derheqê we da hatibe dayîn.
- Bi zimanekî ku hûn jê famdikin li ser pêşveçûna serlêdana xwe, li ser demên ji bo astên cûdatî ya serlêdanên xwe, ji bo mafê serlêdana paşî û biryarên tekildarî agahdar bin.
- Mafê we û wergerîya bêdirav/bêpere di astên cûdatîya serlêdanên we li yekemin jî dûyemû, bitaybetî li hevpeyvînê li hember Nivîsgeha Penaberî heye.
- Mafê vegerandina bi dilxwazî ji bo welatê we heye.
- Têkîlîyê bi Komîsyona Bilind a Neteweyên Yekbûyî re ji bo Penaberan an jî bi rêxistinekî ku piştgirîya yasayî, bijîjkî û derûnî dide re daynîn.
- Mafê alîkarîya aborî, heger hûn nexebitin û çavkanîyên we yên aborî têra pêdiviyên we qîm nekin.
- Mafê rûniştina li Navendek Mêvanperweriyê an jî cîhên din (bernameyên ji bo cîhên rûniştin li xanîyên taybetî an jî otêlan).
- Mafê karkirinê di bin şert û mercên ku ji hêla yasayên Yunanîstanê ve hatinekirin, piştî ku şêst (60) roj ji roja daxwazîya serlêdana parastina navneteweyî re derbasbibin, û ew jî heger Bergenameya-qerta Daxwazker/a ParastinaNavneteweyî hebe.
- Mafê derxistina Hejmara Tomarkirina Bacê (A.F.M).
- Mafû erkên sîgortayê/bîmayê wekî karmendên/an hemwelatîyan Yûnan.
- Mafê gîhandina lênerîna nexweşxaneyî û bijîjkê-dermankî bi dayîna Hejmara Sîgorteya Demkî û Tenduristiya Biyanîyan (P.A.A.Y.P.A).
- Mafê gihîştina perwerdeya giştî ya fermî bêdirav/bêpere ji bo serlêderên zarokan/ên ku emrê wan ji hîjdesalî biçûktir.
- Mafê gihîştina perwerdeya navîn ji bo serlêderên gîhayî/mezin.
- Mafê gihîştina perwerdeya karî/pîşeyî.

**β)Erkên Daxwazkarê/a Parastina Navnetewî**

Wek serlêderên/an parastina navnetewî li Yûnan hûn xwedî erkên li jêr in:

- Piştî ketina Yûnanîstanê yekser serlêdana parastina navnetewî bixwazin.

- Her dem bergenameya-qerta serlêdarî bi xwe re hilgirin. Bergename-qerta serlêdana parastina netewî a demkî ye ku maf û erkên taybetî peyda dike, û ne wek destûra rûniştinê ye.
- Bala we li ser nûkirina berganemaye we hebi û berî bidawîbûna wê, û herî dereng roja xebatê ya din a wî nû bikin.
- Heya ku serlêdana we bidawî bibe li Yûnanîstanê bimînin. Hûn nikarin li derkevin derveyî Yûnanîstanê –ji bilî rewşên taybetî dema ku sedemên girîng yên mirovahî derdikevi û hebûna we li welatek din ferz dike, wek sedemên tenduristiyê yên bikarin îspatbikin. Divê hûn serî li Nivîsgeha Penaberîyê bikin ji bo derxistina belgeya rêwîtîyê-pasaport.
- Hevkarîya bi rayedarên Yûnanî re bikin ji bo agahîyên li ser her mijarekê ku bi serlêdana we girêdayî ye û verastkirina agahîyên nasnameya we.
- Amade bin li Nivîsgeha Penaberî ji bo hevpeyvîna we ya plansazkirî.
- Heger rayedarên Yûnan gazî we bikin, bi şexs bêyî dereng bimînin, amade bin.
- Belgeya rêwîtiya xwe radest bikin û her belgeyek din ku di destê we de ye ku bi lêkolîna daxwaznameya we û belgeyên nasnameya we re têkildar e pêşkêş bikin.
- Nivîsgeha Penaberîyê yekser agahdar bikin ji bo nîştecihbûnê û agahîyên têkîlîyên we, û her guhertinan ciyên mayîna xwe. Hûn dikarin bi rêya serlêdana elektronîk ji bo guhertina agahîyên têkîlîyê nuh bikin. Ji Nivîsgeha Penaberîyê re peyamekî bişîne li ser agahîyên we ye têkildarî (email, adresê,navnişana xanîyen) ku li ser belgeyên we hene û bila tekildariya we bi e-mail a we hebe.
- Werin li Nivîsgeha Penaberiyê ji bo tomarkirina zarokên ku li Yûnanîstanê çêbûne, piştî tomarkirina serlêdana we, bi pêşkêşkirina belgeya jidayikbûna wan.
- Demên ku ji aliyê rayêdarên berpirsîyar da ji we re tên dayîn ji bo astên cûda yê pêvajoya lêkolinê serlêdana we pêk bînin.
- Heger hûn ji Komara Yûnan alîkarî distînin rewşa xwe ya aborî ya rastî veneşêrin.
- Dema hûn li Navenda Pêşwazî û Nasnamekirin, Wargeha-kamp Mevanperwerî an jî ji ciyên niştgehên din dimînin, rêzikên xebatê bişopînin û bêyî agahdarîya rayedarên berpirsîyar ji van deran dernekevin.
- Ji bo her serlêdana paşî (dûyem) an jî serlêdana paşerojê din, divê hûn bi serlêdana xwe re meqbûzek sê sed (300€)Evro bişînin, ku ew jî bi pêvajoya xercê wergirtina elektronîk (e-Παράβολο) tê derxistin. Di mijara malbatekê de, pêwiste ku ji bo her endamek cuda xercê wekhev were razandin.

Binpêkirina erk a hevkarîyê bi rayedarên Berpirsîyar, wekî li jor hatîye diyarkirin, û bi taybetî bêpêwendî/têkilî bi Rayedarên û gava hevkarî nekirin ji bo diyarkirina agahdariya pêwist ji bo lêkolîna serlêdana we, ku ew bi xwe dibe sedema astengiyê bidawîkirina bêkêmasî ya pêvajoya lêkolînê parastina navnetewî, bi xwe redkirina serlêdanê pêk tîne.
Binpêkirina erkên li jor dibe sedema betalkirina an jî bisînordanina tiştên ku hûn distînin (wekî: diravdanî/pêdanî, xanî ûhw).

## 6. Vegerandina Dilxwazî ji bo Welatê we

Heger hûn bixwazin piştî ku we dev ji pêvajoya penaberîyê berdin mafê we heye ku vegerin welatê xwe.

Kesên ku dixwazin bi dilxwazî vegerin, ji bo agahdarîya bêtir tên şandin li Rêxistina Navneteweyî ya Koçberîyê (D.O.M an jî I.O.M), ku ew pêvajoya vegerandina welatê we dike.

Hûn dikarin di derbarê bernameya vegerandina dilxwazî ya D.O.M. de zêdetir **li vir** bibînin.
**A dawî, em dixwazin we agahdar bikin ku têxistin û têketina Nivîsgeha Penaberîyê ev**

**tiştên li jêr, qedexe ne: çek, tiştên birînê an jî tiştên ku bikaranîna wan dibin sedema birîndarbûnê û teqînê û tiştên/madeyên şewitandinê, kîmyewî ê jehrî.**